

Hejmara tuşbûyên

HIV li Îranê bilind

dibe

»»» R:7



Mîstefa Hicrî:
Ji bo me têkbi-
rina sîstema Komara
Îslamî aranceke
micid e

»»» R:3



Pêşmerge û

qirmîna çekê

»»» R:3



Rostem Cehangîrî:

“Roja Pêşmerge ber-
hema Komara Kurdis-
tanê ye”

»»» R:6



Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasaî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (364) 22-12-2019 Buha (1000) Tûmen

26`ê Sermawezê, roja “Pêşmerge Kurdiştanê” bilind hate ragirtin

Bi hilkefta 26`ê Sermawezê, roja “Pêşmerge Kurdiştanê”, rêûresmeke mezin li yek ji binkeyên PDKÎ bi amadebûna endamên Navenda Siyasaî û Desteya Kargêrî, kadr, pêşmerge û malbatên wan hate lidarxistin.

Rêûresm bi marşa “Ey Reqîb” ji aliyê pêşmergeyên Hêza Pêşmerge Kurdiştanê ve dest pêkir.

Piştê bi nûneratiya pêşmergeyên kevnaar ên Hêza Pêşmerge Kurdiştanê û bi awayekî simbolîk, alaya pîroz a Kurdiştanê û logoya hêza Pêşmerge Kurdiştanê ji aliyê du pêşmergeyên kevnaar ên Kurdiştanê ve radeştî nifşa nû hate kirin, da ku rêya wan bi-domînin.

Piştê “Hesen Şereffî” Cihgirê Yekem yê Lêpirsyarê Giştî ê PDKÎ û “Kawe Behramî”, berpîrsê Dezgeha Fermandehiyê “san” li hêza Pêşmerge Kurdiştanê dît.

Hêzên hêza Pêşmerge Kurdiştanê bi çend desteyan, rêjeya leşkerî encam dan. Beşeke din a rêûresmê pêkhatibû ji manoreke leşkerî a komek ji pêşmergeyên hêza



Pêşmerge Kurdiştanê.

Her di vê rêûresmê de jî komeke din ji pêşmergeyên canfida yên ku tevli refên pêşmerge bibûn, merasima dawîpêhatina dewra wan jî her di vê rêûresmê de hate lidarxistin, û xelata kesên ku serkevtin di warê siyasaî û dîsîpîlînê de bi dest anîbûn, bi ser wan de hate parvekirin.

Beşa duyem a vê rêûresmê di yek ji salonên pdkî de bi amadebûna endamên rêberiya PDKÎ, kadr, pêşmerge û malbatên şehîdan û malbatên pêşmerge hate lidarxistin.

Di destpêka vê rêûresmê ya beşa duyem de dîsan marşa netewî ji aliyê komek ji pêşmergeyên dêrîn ên PDKÎ ve hate xwandin.

Piştê “Sidîq Derwîşî” cihgirê Dezgeha Fermandehiyê jî peyama Dezgeha Fermandehiyê pêşkêşê amadebûyan kir.

Di pareke din a vê rêûresmê de, lewhên rêzjêgirtinê ji aliyê cihgirê yekem yê Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ ve bi ser wan kesên ku 20 sal bi ser tekoşîna pêşmergeyatiya wan re derbas dibû, hate parvekirin. Ev rêûresme bi gotina çend helbest û stran û bi dîlana xakîpoşan dawî pê hat.

Sergotar

Pêşmerge û qirmîna çekê

N: Kerîm Perwîzî

Dema ku tu navê pêşmerge dibihîzî, yekem wêneyê ku di mêtîyê te de çê dibe, mirovekî Kurd e ku çêkeke sade ya yekkesî li ser milên wî ye, û li ser çiyayekî Kurdiştanê sekinî ye, û li nîştimana xwe dinihêre.

Ew wêne serî heta binî pir e ji remz û hêmayan, ku ji dîroka xebata neteweyekê ve çavkanî digre, ku wekî çiya berdewam ketiye ber êrîşa şûr û mûşek û bombeya kerb û kîna koloniyalîzma tawanbar û her wekî çiya li ser piyên xwe bûye, û niha jî ser piyan e, û di nava dilê dîrokê de li ser piyan sekinî ye, ew jî bi laşeke bixwîn lê bi serêkî bilind ve.

Pêşmerge ew mirov e li Kurdiştanê, ku dibe remza herman û man û xweragirî û kolnedanê. Ji pêşmerge ve nepeniyên çiya dirêjne nava hundirê gel, û xortên nivşa nû li gora wê pêdigihîjin û perwerde dibin.

Lê ew wêne renga me raştî şaşiyên jî bike. Renge ku me jêve be ku tenê di dema tengasiyan de ye, ku hêzeke dijîgelî ya koloniyalîstî mijûlî kuştina xelkê ye, yan mijûlî wêrankirina cihekî Kurdiştanê ye, bêt û wan bide ber gulleyan, û cardin ew pêşmerge vegere hêlûna pilingan û jiyan bi asayî berdewam dibe...

Ew cureya lênihêrînê li pêşmerge hinek ji aliyên heqîqetê ji me vedişêre, jiber ku wêneyeke nivîşkan e, û tenê kuncêke biçûk a felsefeyê û baweriyaya pêşmerge diselimîne.

Pêşmergebûn ew biyave tê de ye, ku berbirûyê hêza dijmin dibe, û bi qirmîna çeka xwe bêdengiya tal ya dîrokê

Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ digel endamê parlemana Fedral ya Beljîkê civîn pêk anî



Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ di serdana xwe ya Ewropayê de, digel endamê Komîteya Bergirî a welatê Beljîkê, civînek pêkanî.

Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, “Mîstefa Hicrî” di çarçoveya serdanek û bi mebesta beşdarîkirin li konferasek di Parlemana Ewropayê de, roja Çarşemî 20`ê Sermawezê, li Parlemana Fîdral ya Beljîkê, digel “Tîm Wandênpût”, yê Partiya Lîbral a Beljîkê û endamê Komîteya Bergirîya wî welatî, hevdiînek pêkanî.

Di wê civînê de, Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, baseke hûr li ser pêşhatiyên wê dawiyê yên li Kurdistan û Îranê, xîste ber bas û basek jî, li ser pisra Kurd di Îrana niha de kir.

Di wê çaroveyê de, zêdetir bas li xwenîşandanên wê dawiyê yên di Îran û Kurdiştanê de kir û îşare bi hejmara qurbanîyên wan serhildanan û herwisa ew tawanên ku rejîma Îslam li dijî xelkê encam daye kir.

“Tîm Wandênpût”, komek pirsyar û têbînî anî ber bas ku, wek xwe û wek Partiya wan li çarçoveya parlemana Fîdral de dikarin encam bidin.

Di encama wê civînê de, herdu alî, tekez li ser berdewamiya wan pêwendiyane kirin û hevdem li ser wê mijarê bas hate kirin ku, ji aliyê piraktîk de ew çawa dikarin alîkariya pirsra Kurd bi giştî û pirsra Kurd di Rojhilatê Kurdiştanê de bikin.

dişkîne, ew morlêdana li deştanên dîrokê û li hemaseyên xweragirî û canbaziya pêşmerge, bi sedan carî hatiye dubarekirin, û gellek

caran jî gihîştîye lûtkeyê. Di hinek wêneyên bêwêne de jî, wekî mamoste Mela Hesênê Şêweselî, herwa di lûtkeyê de maye û dimîne.

Lê pêşmergebûn tenê nehatiye girêdan bi vê biyavê ve, ku carna teqeya çekên wê bê, belku niha û piştî zêdetir ji heft dehikan ku bi ser jidayîkbûna pêşmerge re derbaz dibe, remz û hêmaya pêşmerge ji pilingeke çiyayên serkêş ên Kurdiştanê ve bûye vîneke giştî ya neteweyî bo binge-hdanîna nîştîmaneke nû. Bi vê watayê ku êdî pêşmerge bi tenê mirovekî-ê heqîqî nîne, ku êş û janê dikîşîne, û erk û wezîfeyê dikîşîne stûyê xwe, niha pêşmerge bawerî ye, û rijîya ye nava hundirê xelkê de. Lewra pêşmergebûn tenê di çekhilgirê çiya de nemaye, û hemû şîpelên xelkê Kurdiştanê bi xwe ve digre.

Pêşmergebûn remz û hêviya pêkvebûna neteweyî ye ku di îradeya şoreşgerî a xelkê de form digre. Lênihêrîna nû ji bo pêşmergebûnê, pêk tê ji vê îradeyê ku her bîstekê bi hêmawergirtin ji wî wêneyî ku di deştêkê de me bas kir berdibe canê dijmin, û erka xebatê tenê ji bo çend kesên taybet cih nahêle, belku hemû takek moral û baweriyaya bûn bi pêşmerge tê de ye, û hemû kolaneke Kurdiştanê dikare bibe çepereke pêşmerge. Herikîna xortên cesûr û bihelwest ên nîştîman di nava civakê de, ber bi çiya di forma vîneke giştîgîr û xebatkarane de berevajî dibe, û vedigere nava dilê bajar, ji bo berbirûbûna dagîrkerî û hêza tawankar.

Miştefa Hicrî: Ji bo me têkbirina sîstema Komara Îslamî armanceke micid e

Lêpirsyarê giştî ê PDKÎ di axavtinekê de derheq rewsê Kurdiştana Îranê, bas ji ferq û cudahîdanîna sîstematîk di Îrana li jêr deshîlata Komara Îslamiya Îranê de kir, û ragehand ku têkbirina Komara Îslamî ji me Kurdan re armanceke cidî ye.

Deqa gotara navbirî, weha ye:

Em û “yên din” ên hikûmeta Îranê

Îranê erdnîgariyeke çend-neteweyî heye, û aliyê kêm şeş neteweyên mezin û çend kêmanî û pêkhateyên din tê de dijîn. Her yek ji wan neteweyan xwediyê xak û nîştimana xwe ne. Neteweya Kurd yek ji wan neteweyan e ku nêzik bi %10 ji akinciyên Îranê pêk tîne, û di parêzgehên Urmiye û Sine û Kirmaşan û Îlamê û beşên din ên vê erdnîgariyê de dijîn. Herçend ku ew neteweyane ji dîtingeha siyaseta dewleta Îranê ve wekî kêmanî tene hesabandin, lê li ser hev piraniya akinciyên rûniştîyên Îranê pêk tînin. Serbarê çendrengî û çend-netewebûna Îranê, pêkhatiya hikûmeta niha û ya berê digel ve çendrengiyê yekreng nebûye, û ya ku hebûye înkâr û helandin û nehêştina van cudahiyan bûye. Deshîlat di navendê de ji aliyê neteweya serdestê ve hatiye qorixkirin û di hev kêşeyeke bi navê “navend-derdor” (navend-perawêz) de, pirsê çendneteweyî di Îranê de, tu demekê di destûra bingehîn û gotara nasyonalîzma Îranî de pêgeheke wê tunebûye. Belku wekî kêşeyeke heştiyar û pirsê emnîyetî hatiye şirovekirin. Hertim di gotara nasyonalîzma Îranî de merem ji “navend” neteweya serdestê ya Fars bûye ku neteweyên bindestê wekî “yên din” (bîhanî) bi nav dike.

Lê di nav Kurdiştanê de bi sedema pêşîneya azadîx-wazî û asta bilind ya serwextî û hişyariya neteweyî her di destpêka sazûna wê û bideştvegirtina deshîlatê ji



aliyê Komara Îslamî ve, bûye qada berxwedanê, ku di bîrdanka dîroka xwe ya biçirûsk û bişewq de wekî çepera azadiyê tê naskirin. Xomêynî di 19.08.1979-an de fetwaya cîhadê li dijî Kurd derkir, ku heya niha jî ew yek berdewam e. Di encama vê siyaseta de metirsiya cidî li ser nasname û ewlehiya neteweyî ya Kurd hatiye çêkirin, ku çendîn biyavên curbicur bi xwe ve digre.

Herçend ku stema neteweyî li hemû bindestan tê kirin, lê di Kurdiştanê de ew stema çend qatan zêdetir e. Di çarçoveya stema neteweyî de, navçeyên neteweyên xeyrî Fars, rengûrûyê erdnîgariya serkut û dagîrkariyê bi xwe ve girtine.

Merem ji stema neteweyî ew rews e ku li gora pîvana aborî, siyasî, civakî, û ewlehî û li çav navendê, herêmên neteweyên xeyrî Fars stema li wan tê kirin, û tene çewsandin. Taybetmendiya navendgerî û dewr û rola yekalîker ya îdeolojiya nasyonalîzma Îranî weha kiriye ku nasnameya navendê li dijî nasnameya “yên din” be. Di vî biyavî de her biryar yan piroseyek ku ji navendê ve berbirûyê hebûn û mana Kurd û neteweyên din bûye, raşterast nasname û ewlehiya wan kiriye armanc. Deshîlatê di Îranê de wateyeke xwesepîner û dagîrker heye û berdewam hewl daye ku hemû serwet û saman û çavkaniyên navçeyên neteweyî talan û kontrol bike.

Dijberîkirina mafê diyarîkirina çarenûsê, serkuta sîstematîk û nebûna derfeta çalakiyên siyasî û yasayî û talankirina serwet û saman û çavkaniyên Kurdiştanê û veguhaştina wan ber bi navendê û koçkirina bi milyonî ya akinciyên û hewldana bo guherîna demografiya Kurdiştanê û anîna bikom ya karbidest û berpîrsên îdarî û birêveberên bîhanî ên ser bi Spaha Pasdaran û hêzên ewlehiyê, û piştguhxiştina bijardeyên Kurd, kuştina rojane ya kolber û kasibkaran û teqekirina li jîngehparêzan û çalakên medenî û mafê jinan û bidarvekirin û girtin û bêserûşûnkirina lêkolerên kurd, veguhaştina çavkaniyên avê, têkdana jîngehê û şewitandina dariştanên berbiniya Zagrosê û mînrêjkirina navçeyên sînorî, milîtarîzekirina gund û bajaran, emnîyetîkirina îdare, xwendîngeh, mizgewt û cihên giştî mînakên selimandina vê raştîyê ne ku bi tewahiya wateya peyvê pêwendîyeke dagîrkarî û çewsandinê bi ser Kurdiştanê de zal e.

Peyrewkirina sîstema perwerdehiyê, û ragehandina îdeolojîk di pêxema bicihkirina vî bîrokeyê de ye ku Îran yek netewe ye, û neteweyên din qewm û hûrdeçand in. Asimîlekirina ziman, dîrok, nasname, deb û nerît, û bi awayekî giştî hewla têkbirina wan û helandina wan e ku di mediya û pirtûkên dersî, şano, sînema, û pirojeyên emnî û ferhengî de reng vedaye, xala balkêş, bicihbûna siyaseta înkarkirin û

çewsandinê di deqa yasayên Îranê de ye.

Pîvaneke girîng ku di warê stema û ferq û cudahîdanîna de çend qat zêdetir balkêş e, mijara vegeşîna aborî û civakî û mijarên pêwendîdar bi vî yekê ne. Di serdema hevçerx de navendê hewl daye ku tevî guherîna demografiya herêmên neteweyî, waw herêman di asteke nizm de rabigre, û wan ji standardên jiyana îroyîn bêpar bike. Dahatek ku li aboriya yekberhemîya Îranê tê bidestxistin, û samana giştî a vî welatî ji bo pirojeyên emnî û çandî û leşkerî tê xerckirin, ku her ew jî, armanca wê pêkanîna astengiyên e li ser riya neteweyan bona gihîştina bi mafên xwe. Amarên rejîmê ên fermî bixwe pîvaneke din in bona nîrxandin û berhevdanîna vî nehevsengiyê. Bo mînak li parêzgeha Îlamê di warê xweşewitandina jinan û akinciyên wê di asta Îranê de pileya yekem heye. Parêzgeha Kirmaşanê di warê békariyê de pileya yekem heye. Bi rêje be jî, bajar û navçeyên din ên Kurdiştanê di biyavê van diyardeyan û komeke kirîzên din bi berhevdanîna digel gişt herêmên din zêdetirîn pişk ber ketiye.

Stema neteweyî di Îranê de li ser du stûnan xwe ragirtiye, yekem, pêkhatiya hikûmetê û yasa û deshîlata wê ye, û ya duyem jî bi nav opozîsyon, rewşenbîr, akadîmîsyen, û teorîsyenên çemk û têgeha “Îranşar” û şovenîzma Îranî ye ku gotar û mijaran berhem tînin, û didanên serzarê deshîlata stema, da ku hêcetêkê ji bo sed salan çewsandinê ava bikin. Heta beşek ji bi nav opozîsyonê zêdetir ji vî ku taya (ta û lerza) herifandina rejîma siyasî ya niha hatibe wan, nîgeranê bêcî yê siberoja xaka Îranê ne, û tirseke veşartî hene ku di nava rûpelên nivîs û

»»»Doma R: 3

helwest û boçûnên wan de eşkere dibe.

Deriyê berjewendiya neteweyî ya Îranî li ser koka serweriya “yek netewe” dizivire. Her mijarek ku girêdayî be bi hezkirina li qorixkirin û pawanxwaziya wan ve, neteweyî, pêşketî, û fermî tê hesibandin, û biyavê yasayî pê tê dayîn. Di hember de ya ku pêwendî bi hezkirina pawanxwazane ya wan ve, wekî neteweyî, pêşkevî, û fermî tê hesibandin, şovînîzma navendê, wekî neteweyî, xelkserdeştiya ayîni, nasyonîzma Îranî û nasyonîzma medenî tê zanîn, di hember de dengê azadîxwazî û tevegra neteweyî û demokratîk ya “ên din” wekî tayifegerî, qewmgerî, nasyonîzma qewmî, tevdanîkarî, girêdayîbûna bi bîhaniyan, cudahîxwazî, û derbazbûna ji hêla ewlehiya neteweyî û serweriya navendê hatiye şirovekirin, û di raştî de cewhera raştî ya gotara navendê ye ku di teorîzekirina şovînîzma “baştanger” (kevnarxwazî) ya serdema Pehlewî û piştî di serdema Komara Îslamî de rehên wê ên dîrokî diyar in.

Di Komara Îslamî de, Îrana Îslamî ew têgeh bûye ku bi

riya hejmûna zimanê Farsî, xwendineke taybet ji “yek ayîn” û vejeriyana bo nîrxên şarîstanî hatiye pênasekirin, û edebiyat û deqa taybet li ser berhem aniyê. Stema neteweyî di bingeh de bi riya danîna sînoren newekheviyê di navbera navend û “ên din” de pêk hatiye, ku biyavên erdnîgarî, aborî, siyas, yasayî, çandî, zimanî, jîngehî, û ayîni heye. Di vê jîngeha siyasî û hizrî de ye ku riya gihîştina piraniyê bi mafên xwe ji aliyê kêmaniya Fars ve aşteng jê re hatine pêkanîn, û bi awayê herî tund dîberiya wê tê kirin.

Digel vê ku em wekî PDKÎ ji dîtingeha nasnameyê ve li pîrsa neteweyî dinêrin, lê ji dîtingeha îdarî û mafê hevvelatîbûnê ve jî be, tu derfetek bo Kurd û neteweyên din nemaye. Lewra ji dîtingeha heştkirina bi berpirsariyê ve li hemberî neteweya xwe em li ser cewher û naveroka mafê xwe yê neteweyî pêdagir in.

Hişmendiya bêbingeh li ser cudaxwaziya neteweyan ji aliyê navendê ve, kirîza ewlehiya neteweyî bo “ên din” pêk aniyê. Berdewambûna rewşeke weha paldereke xwezayî û fakereke bihêz e bo derbazbûna Kurd û “ên din” ji vê rewşa dugm û daxîstî. Rewşa niha bi tewahî rewşa binbestê ye. Bi vê watereyê ku serbarê hebûna kome-

ke kirîzên li ser hev kelebûyî (kombûyî) ên siyasî, aborî, civakî, jîngehî û îdarî, pîrsa neteweyî ya neteweyan çaresernekirî maye.

Digel vê yekê de jî navend li hemberî van pîrsan bersivder nine, belku tenê li hemberî ewlehî û berjewendiya wê ya pênasekirî xwe berpirsariyê dihesibîne, ku encama wê bûye hêlana erdnîgarî ya serkut û dagîrkeriyê ku neteweyên bindestê tê de akincî ne. Hemû ew mînakên baskirî û pêdagîriya navendê li ser berdewambûna siyaseteke weha nedirust, dûredîmena mana neteweya Kurd û neteweyên din bi awayekî dilxwaz û bi awayekî aştîxwazane di Îraneke yekgirtî û yekparçe de gellek lawaz kiriye. Lewra jî xwestek û îradeya cudabûnê di nava wan de rû li hilkişiyane ye, û ew yek bûye gotara beşeke berçav ji raya giştî ya “ên din” ên navendê.

Reh û rîşeya vê dijberiya Kurd û neteweyên din û îradeya berxwedan û berbirûbûna wan li hemberî navendê dibe di nava xebat û tekoşana berdewam ya wan di qonaxên heştiyar ên temenê Komara Îslamî de xwendin jê re bê kirin. Dawî mînaka berçav ya vê berbirûbûnê meş û serhildanên van rojên derbazbûyî bû ku li gora zanyarî û raporên meydanî û yek ji wan rapora rêxirawa lêborîna navnetew-

eyî piraniya qurbaniyan li erdnîgarîya neteweyên bindest û bi taybetî li Ehwarz û Kurdiştanê rû dane. Ew bûyerane xalên guherînê û yekalîker in ku bûne sedema berfirehtirbûna valahiyên di navbera navend û neteweyên bindest de.

Bo me her bi vê radeyê ku hilweşandina Komara Îslamî armanca me ye, her bi vê radeyê jî pîrsa neteweyî û demokrasiyê du hêlên sereke û pîrensîpên neguher in, lê girîngtir ji van derbazbûna ji hişmendiyeke ye ku bixwaze ezmûna rejîmên paşayeti û Îslamî dubare bike. Her lewra em li ser vê baweriyê ne ku derbazbûna ji binbesta siyasî ya niha û bingehdanîna sîstemeke kêrhatî û bersivder di siberojê de hewcehî bi xwendin û hişmendiyeke cuda heye.

Derbazbûyî selimandiye ku her sîstemeke siyasî ku di welatekî çendneteweyî de hildiweşe û her welateke weha ku perçe-perçe dibe, encama komkirina bêqas ya deshilatê ye li navendê û ferq û cudahîdanî û înkarkirina “ên din” e, ku dawîcar dibe sedema teqîna nerizayeti û kerb û kîna pendavbûyî û radîkalîzma şoreşgerane ya zulmlêkirîyan. Kurd û “ên din” ên dewleta Îranê li pey serwerî û mafê diyarîkirina qedera xwe ne, bi her awayekî ku ji dest wan bê.

“Navenda Havkarî” hevderdiya xwe bi malbatên kolberan re nîşan da

Navenda Havkarî a Partiyên Kurdiştana Îranê tawanên rejîma Îranê, nemaze teqeya rasteraşt li kolberan û kuştina kolberan li çiyayên Kurdiştanê şermezar dîke û di heman demê de hevderdiya xwe digel malbatên kolberan û jînê nîşan da.

Navenda Havkarî di peyamekê de belavkiriye, di rojên derbasbûyî de çendîn ciwanên Kurd yê xelkê Merîwan û derdora wî bajarî ku bo bideştveanîna bijîwa jiyanên xwe û malbatên xwe bo kolberîkirinê rû li sînoren Kurdiştanê kiribûn, raştî sir û seqam û befirê tînen lê mixabin kesk ji wan canê xwe ji dest

dide.

Di vê derheqê de, tenê di hefteya derbasbûyî de 10 kolber ji deverên sînori yê Merîwan, Pîranşar, Serdeşt û Baneyê bi teqeya rasteraşt a hêzên leşkerî ên rejîma Îranê yan jî bi sedema sir û befirê canê xwe ji dest dane û birîndar kirine.

Di beşeke din a vê peyamê de hatiye ku, çarenûsa kolberekî 14 salî yê bi navê “Ferhad Xusrewî”, xelkê “Nê” a girêdayê bajarê Merîwanê heştajî nexuyaye.

Di dawiya vê peyamê de hatiye ku, em wan kuştar û kirdarên rejîma Îranê bitundî



ناوهندی هاوکاری حیزبهکانی کوردستانی ئێران
Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.
مرکز همکاری احزاب کوردستان ایران

şermezar dîkin û tevî teikîdkirina hewlên navxweyî û derveyên me bo givaş xîştin li ser rejîma Îranê û paraştina canê kolberan, em heştajî hevsozî û hevxiyariya xwe bo malbatên nan û jînê nîşan didin.

Herwisa em rejîma Îranê berpirs û sedema bûyerên wiha dizanin û her di vê pêxemê de em careke din dúbare dîkin hewceye ku siyaseta binpêkarî û piştguhxiştina Kurdiştanê dawî pêbîne û desthilata navendî li hember arîşeyên kolberan û paraştina canê wan berpirsariyê be.

Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ serdana Senaya Beljîkê kir

Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê di çarçoveya serdana xwe ya Ewropayê de, Piştî konferansa “paşeroja girûpên îtnîkî li Îranê”, digel “Mark Dê Mêsmarkir” Sênatorê Beljîkî civîn pêkanî.

“Mîstefa Hicrî” Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ ku bi merema amadebûn li konferansê di parlemana Ewropayê de, serdana welatê Beljîkê kiriye, roja Îne 22`ê Sermawez 1398`an, civînek digel Sênator “Mark Dê Mêsmarkir” pêkanî. Di vê hevdiînê de,



Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, basek bi hûrî li ser dawîpêşhatiyên Kurdiştan û Îranê kir û basek li ser pîrsa Kurd di Îrana niha de kir. Di vê çarçoveyê de zêdetir bas li

ser xwenîşandanên wê dawiyê û ew tawanên ku rejîmê Îslamî li dijî xelkê Kurdiştan û Îranê encam daye kir û herwisa îşare bi hejmara kuştîyên serhildana wê dawiyê ya Îranê û Kurdiştanê kir.

Eva ku bo Sênator “Mîsmakir” cihê pejirandê bû xîstina rojevê ya wê mijarê bû ku çawa welatên Ewropayê dikarin havkar û rêgirbin li ser serweriyên rejîma Îranê, bi wî watayî ku welatên Ewropayê wek endamên cuda dikarin aştengiyên bo rejîma Îranê zêdetir çê bikin.

“Mîstefa Hicrî” ji wê aliyê ve ku çawa bikare rejîma Îranê li hember daxwazên xelkê û wî dîktatorê di deverê de neçar bi paşekêşiyê bike, bir û ramanên xwe xîste ber bas. Di encama civînê de Lêpirsyarê Hizbê daxwaz kir ku Sêna bi havkariya parlemana Fedral a Beljîkê li hember rejîma Îslamî micid bin daku ew rejîme paşekêşiyê pê bêkirin û bo wê mebestê jî komek pêşniyar pêşkêş kir. Di heman demê de daxwaz kir ku piştevanê xelkê û hêzên demokratîkxwaz li Îran û Kurdiştanê bin.

Şandekê KNK serdana PDKÎ kir

Şandekê KNKê serdana Dezgeha Pêwendiyên Partiya Demokrat kir û pîrsa Kurd û guhertinên deverê anîne ber bas.

Piştînivroya roja Sêşemî, 19`ê Sermawez (10`ê Kanûna Pêşînê), şandekê Kongireya Netewî ya Kurd (KNK), bi serokatîya “Ehmed Qeremûsî”, hevserokê KNKê û Şehla Hefîd, cihgira Hevserokê KNKê, serdana Dezgeha Pêwendiyên PDKÎ kir û ji aliyê heyetê PDKÎ ve, bi serpereştîya “Mihemednezîf Qadirî”, cihgirê Duhem ê Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ û berpîrsê Dezgeha Pêwendiyên Partiya Demokrat ve, pêşewaziya ji wan hate kirin.

Di destpêka vê serdanê de, “Mihemednezîf Qadirî”, bi germî xêrhatina wan kir. Şanda mêvan jî tevî



nîşandana keyfxweşiya xwe ji vê serdanê, dîrok û derbasbûya PDKÎ bi taybet rêberên Şehîd yên PDKÎ bi parek ji serweriya netewa Kurd dane zanîn.

Piştî, “Ehmed Qeremûsî”, hevserokê KNKê kurtiyek ji xebat û çalakiyên KNKê pêşkêş kir, û bas kir ku mebesta wan ji vê serdanê, şiroveya hevbeş a ser guhertinan û peydakirina rêçareyek bo pîrsgirêkên li ser doza Kurd di her çar parên Kurdiştanê de ye.

Piştî “Mihemednezîf Qadirî”, berpîrsê heyeta Partiya Demokrat, tevî îşarekirin bi beşdariya Şandekê PDKÎ di kongireya berê a KNKê de, alîkarî û hevhelwîstên hemû aliyan bi merema bi pêşxistina xebata Kurd di her çar parên Kurdiştanê de bi girîngî da zanîn.

Herwisa navbirî basek li ser şiroveya guhertinên deverê û cihanê û bandora wan li ser pîrsa Kurd bi giştî û herwisa eşkerakirina siyasat û helwîstên PDKÎ li ser pîrsa netewî û alugorên girêdayî bi wan pîrsan ve, pêşkêş kir û hêviya serketin bo kongireya bê ya KNKê kir.

Piştî, “Ehmed Qeremûsî”, tevî îşarekirin bi derfet û gefên li ser rêya doza rewya Kurd, ku niha di her çar parên Kurdiştanê de di rojevê

de ne, û ragihand hewceye bi yekdengî û di jêr çetereke siyasetîkî nîştîmanî ya hemûalî de, li hember bisekinin ku, kongireya bê ya KNKê di raştîyê de li seha berpîrsayetiye bi wan hewcehiyan û bersivdan bi wan alugoran re pêngavan diavêj e.

Herwisa Qeremûsî got ku, me bi merema vekirina rûpelekî nû di kar û çalakiyên û pêwendiyên xwe de, me pê başe ku hizrên Hizb û aliyan din û pêşniyarên wan bo kongireya bê a xwe agehdar bin, û em hizrên PDKÎ di wê derheqê de, bi rênimayiyekî girinê û pir bi nirx dizanin.

Di dawiya vê serdanê de, herdu aliyan tevî nîşandana, keyfxweşiyan xwe ji wê serdanê, tekezî li ser hewcehiya berdeambûna serdanan û alîkariya herdu aliyan kirin.

Kolberekî Kurd li ser sînorê bajarê Banê hate birîndarkirin

Kolberekî Kurd yê xelkê bajarê banê, di encama teqeya raştaşt a hêzên leşkerî li ser sînorê wî bajarî hate birîndarkirin û bo nexweşxanê hate veguhestin.

Li gorî rapora ku gihîştîye Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, roja Duşemî 18`ê Sermawezê, kolberekî Kurd yê bi navê “Yadigar Îsmailî” xelkê gundê “Zilê” ya

ser bi bajarê Banê, bi teqeya raştaşt a hêzên leşkerî hate birîndarkirin.

Hêzên leşkerî yê hikûmetê bi bê agehdarkirina berê, teq li wî kolberê Kurd kirin.


“Yadigar Îsmailî” di wê bûyerê de bi teqa hêzên leşkerî hatibû birîndarkirin û niha li nexweşxana Selahedîn Eyûbî ya bajarê banê di bin tedawi-



ya pizîşkî de ye.

Ew kolberê Kurd xwedan mal û bavê du zaroka ne.

Hevpeyvînek taybet digel rêzdar Roştem Cehangîrî berpîrsê Dezgeha Çavdêrî ya PDKÎ li derheq rol û destkevtên pêşmerge



Roştem Cehangîrî: “Roja Pêşmerge berhema Komara Kurdiştanê ye”

H: Keyhan Mihemednijad

P: Hûn wekî endamê Rêveberiya Hizbê wê rojê çawa dinirxînin?

B: Bi nêrîna min roja 26`ê Sermaweza sala 1324`an (1945)`an, rojeke pir dîrokî ye di bizava rizgarîxwaziya gelê Kurd de li Rojhilatê Kurdiştanê. Her çawa hûn dizanin çend mehan berî wê rojê Partiya Demokrat hate avakirin, û navçeya Mukriyan a Kurdiştanê navçeyek bû ku, li aliyê Bakûrê Îranê Rûsiya hatibûn hundirê Îranê, û wan heya bajarê Urmiye jî xîstibûne di bin kontrola xwe de, û herwisa li Başûrê Îranê jî, hêzên Amerîka û Bîrîtaniya heya parêzgeha Kirmaşanê hatibûn û ev herêm hemû xîstibûn bin kontrola xwe de.

Li navçeya Mukriyanê tenê çend dezgehên hikûmî di destên dewleta Îranê de mabûn, bajarên wekî Sine, Seqiz, Serdeşt û Mehabad, lê ev gellek lawaz bûn. Her bi vê sedemê bû ku, li bajarê Mehabadê rêberayetiya Hizba Demokrat bi serokatiya “Pêşewa Qazî” ku di wê demê de, hem serokê PDKÎ bû hem jî di asta ci-vakî de kesayetiyeke navdar û hezkirî bû, herwisa navbirî nifûzeke zêde di nav xelkê bajarê Mehabadê û derdorê de hebû, û Pêşewa kesekî navdar û hezkirî bû di nav xelkê de, biryar da ku xelkê êrîşî ser binkeyên hêzên çekdar ên rejîma Paşayeti bikin, û eva bû ku xelkê dest bi ser binkeyên rejîma Paşatiyê de

girtin û herwiha li ser avahi-yên hikûmî alaya Kurdiştanê hildan. Bi vî awayî bo cara yekemîn bû ku bajarek bi destê Kurdan bê rizgarkirin. Bi rizigarbûna Mehabad û bajar û bajarokên derdora wê, îdareyên herêmê ketin destê xelkê Kurd de.

Herwisa rewşenbîr û mezinên Mehabad û ên derdora wî bajarî ketin mişûrxwarinê, û tevî Pêşewa û rêberatiya Partiya Demokrat, û li ser bizûtneweya Kurd qerara avakirina Komara Kurdiştanê dan.

Destkevtên Komara Kurdiştanê, Pêşmerge, Spaha Neteweyî (millî), Xwendin û nivîsîn bi zimanê dayîkê, û dehan deskevtên din bûn ku bûne nesîbê Kurdan.

Ev hemû destkevtane encama rizgarkirina Mehabadê di roja 26`ê Sermaweza sala 1324`an de bûne. Ji ber vê yekê ye ku wê rojê roja berxwedanî û roja şikeştana dijminan binav kirine. Roja bideştixistina hikûmeteke Kurdî bo Kurdan e. Ji aliyekî din ve, ku mêze dikî raşt salek paş yanî 26`ê Sermaweza sala 1326`an, her di salroja rizgarkirina Kurdiştanê de dibîni ku, hêza dagîrkar bi piştevaniya hêzên derve yên wekî, Amerîka û Bîrîtaniya hatin û Mehabad dagîr kirin û hemû ev destkevtên Kurdan ji nav birin.

Lê her çawa ku bo we zelal û eyan e, dîsan Hizba Demokrat û gelê me piştî vê têkoşinê yan baştir bêjim wê şikesta mezin ku bi ser de hat, teslîm nebû, û biryara berxwedana neteweyî dan heya ji nav çûna rejîma Paşayeti her berxwedanî kirin û berxwedan serkevtin e.

Herwisa bi hizra min ev roj wekî roja hêza çekdar a Kurdan di Kurdiştana Rojhilat de gellek bicî ye ku bûye avakera hêza Pêşmerge, bûye avakera xebata neteweyî ji rêya çekdarî ve û herwisa bûye avakera hêzekê ku şikestan bike derfet bo berxwedaniyê ku di nav de serkevtin e, Hêza pêşmerge bûye hêzeke cihê bawerî û hezkirî di nav gelê xwe de.

P: Bo çî partiyên din jî vê rojê wekî Roja Pêşmerge Kurdiştanê nas nakin?

B: Bi nêrîna min ger ku wê pîrsê li wan bipîrsin baştir e, lê, her hizbek bixwe hinek hizr û nerîn hene digel partiyên din ku yek nagirin. Lê dibe ku rojek ew mijara bê baskirin û girîng e jî. Lê wê demek bihê holê ku hemû hêzên şoreşvan ên Kurdan yên li Rojhilat di aliyekê de dê dora hev kom bibin û yek bigirin û di wan rojên dîrokî û neteweyî de, bi hev re gengeşeyan pêk bînin, heta biryarê li ser bidin, lê heyani wê demê bi zehmet dibînim ku aliyên Kurd hev qebûl bikin. Diyar e ku çend partiyên Kurd ên Rojhilat ev roja qebûl kirine, lê nebûye rojek ku hemû aliyên Kurd bipejirînin.

P: Gelo ev roje çawa û bo çî di nav dîroka PDKÎ de wekî Roja Pêşmerge hate hesibandin?

B: Min bersiva vê pîrsê di pîrsa yekê de daye, her çawan ku min got di wê rojê de du bûyerên girîng û dîrokî û herwisa li dijî yek li du salên li pey hev rû dane. Hem serkevtinek di nav de hatiye misogerkirin û hem jî herifîna Komarê di wê rojê de rû daye, lê dîsan her di wê rojê de gellek xortên Kurdan hatin desteser û şehîdkirin, yan derbider û malwêran bûn. Lê, xebata xwe her berdewam kirine û heta îro jî her berdewam e. Hekî hêza pêşmerge piştî wê rojê ava nebiba, bi çeka xwe perwerde nebiba, bîr û hizra neteweyî di mejiyê Kurdan de nehatiba perwerdekirin û hizra neteweyî di nav Kurdan de nedihate zindîkirin. Hekî Pêşewa û hevalên wî di girtîgehên Îranê de li hemberî dijminan berxwedanî nekiribûn. Ez wisa hesab dikim ku zehmet bû Kurd careke din rabe ser pêyên xwe. Her bi sedema wan hemû bûyeran

bûn ku roja 17ê Kanûna sala 1945`an (26ê Sermaweza sala 1324`an) wekî Roja Pêşmerge bi nav kirine.

“Hebûna gelê kurd girêdayî Hêza Pêşmerge ye”

P: Gelo bo çî di Başûrê Kurdiştanê de wê rojê wekî roja alayê bi nav dikin û Hizba Demokrat a Kurdiştana Îranê jî wê rojê wekî Roja Pêşmerge dide zanîn?

B: Min bersiva wê pîrsyarê di pîrsên din de got ku xelkê Mehabadê di roja 26`ê Sermaweze de binkeyên hêzên dewleta Îranê li Mehabadê girtin û alaya Kurdiştanê li ser bilindtirîn avahiya wî bajarî hildan.

Ew cara yekem bû ku di dîroka tevgera Kurd de li ser dezgehên hikûmetî yên di nav bajarên Kurdiştanê de yên ku hatibûne rizgarkirin bi awayekî girseyî, alaya Kurdiştanê bi fermî hat hildan û pejrandin. Ez wisa dihesibînim ku ji ber vê yekê ye, ew roje weke roja hildana alaya Kurdiştanê hatiye destnîşankirin û herwisa li Parlemana Başûrê Kurdiştanê de jî, piştî çend salan li ser vê mijarê gengeşe hatine kirin û roja hildana alaya Kurdiştanê li Mehabadê de, wekî roja alaya Kurdiştanê qebûl kirin, xuya ye ku hekî hêza Pêşmerge çî di wê demê wate salên 1945 heya 1946`an, çî di serdema Komara Kurdiştanê de ku dihate qebûlkirin, ku ew roj weke roja hildana ala Kurdiştanê ye, Her dîsan bi hebûna Pêşmerge bûye, hekî Pêşmerge neba, ne Parleman, ne hikûmeta Herêma Kurdiştanê, ne jî xebat di parçên din ên Kurdiştanê de hedibû.

Lêre da hewece ye ku spasiya Parlemantoya Kurdiştana Başûr bikim ku ber bi pêşwaziya dîroka neteweya xwe ve çûn, ku bi awayekî yasayî li parlemanekê de ku hemû nûnerên wê hilbijartiyên gelê Kurd in, li ser qerar dan. Spas bo Parlemana Kurdiştanê.

Nerîna Lîderan



Mîstefa Hicrî:

“Ji bo me têkbirina sîstema Komara Îslamî armaneke micid e”.



Mike Pompeo:

“Ew Çeteyên ku kurên xelkê Îranê dikujin, îzna wan tuneye ku kurên xwe ji bo Amerîkayê bişînin”.



Israel Katz:

“Hekî hewla leşkerî dawî rêya pêşgirtin bi destpêragihîştina Îranê bi çeka navkî be, Îsra'îl wî karî ve bike û amade ye”.



Hesen Rûhanî:

“Piraniya pirsgirêkên Misilmanan bi sedema mudaxilekirina Amerîkayê ye”.

Hejmara tuşbûyên HIV li Îranê bilind dibe



N: Eskender Ceiferî

AIDS an jî nexweşiya HIV, nexweşiyeke pir metirsîdar e û dibe sedema mirina mirov. Di demên derbasbûyî de rêjeya tuşbûyên wê li Îranê bilind bûye. HIV qelskirineke xurt a sîstema parastina canê mirov e û sedema wê vîrûsek ku xeliyeyên taybet ên sîstema parastinê dikuje. Karê herî baş ji bo xweparastin li hemberî wê nexweşiyê ev e ku kesên ku karê seksî bi gelek kesan re dikin, kondoman bi kar bînin.

Perwîn Efser Kazirûnî rêvebera Saziya HIV ya Wezareta Tendiruştiyê ya Îranê dibêje li gor pêşbîniya wan, zêdetirî 66 hezar kesan li Îranê tûş nexweşiya HIV bûne ku tenê 35 hezar kes ji wan ji aliyê dewletê ve hatine tomarkirin û nêzîkî 9 hezar û 500 kesan jî bi wê sedemê mirine. Wezareta Tendiruştiyê jî piştraşt kiriye ku heya deştê 2017'an, 66 hezar û 359 kes li wî welatî tûşî aydzê bûne ku dewletê tenê karîbû navên 34 hezar û 949 kesan tomar bike lê nehatiye xuyakirin ka gelo plana dewletê çawan hatiye bicîkirin. Tevî ku tê gotin ew amar tenê hatine pêşbînîkirin, lê nayê zanîn pêşbîniya tûşbûyan li gor kîjan standardê bûye û nayê zanîn amara ew kesên ku mirine, ya çend mehan e.

Kazirûnî got jî ku 84 ji sedî tûşbûyan zîlam û 16 ji sedî jin in ku temenê 53 ji sedî ji wan kesan di navbera 21 heya 35 saliyê de ye lê piraniya wan di bin çavdêriya tendiruştî de nîn in.

Wê berpirsa Îranî, salekê beriya niha ragihandibû ku 30 hezar û 727 nexweşên aydzê hatine tomarkirin ku dike bi qasî 30 ji sedî hejmara tûşbûyên wê û 70 ji sedî tûşbûyan jî hîn nezanîne ku HIV hene. Her sal ew



amar li Îranê bilind dibe lê amarên ku têne ragihandin, hemû lidij in û ji ber tînebûna saziyên serbixwe di vê derbarê de amareke rastîn tine ye. Mînu Muhrez berpirsa Navenda Lêkolînên HIV li wî welatî, sê salan beriya niha ragihand ku 100 hezar tûşbûyên wê nexweşiyê li wî welatî hene ku nêzîkî 30 hezar kesan hatine tomarkirin. Bi vî rengî xuya dibe ku her sal gelek kes tûşî HIV dibin lê amara tomarkirî, zêde nayê guhertin.

Herwisa Mesûd Merdanî endamê Komîteya Giştî ya HIV li wî welatî daye xuyakirin ku tevî nebûna lêkolînên hûr, li gor pêşbîniya saziya Tendiruştiyê ya Cîhanî, 80 heya 90 hezar tûşbûyên wê nexweşiyê li Îranê hene ku 70 hezar kes ji wan, bixwe jî nizanin ku HIV hene yan jî nexweşiya xwe vedîşêrin. Çalakvanên serbixwe, ji xixmetguzariya dewletê ji bo nexweşên aydzê bi gazin in lê rêvebera Saziya HIV ya Wezareta Tendiruştiyê ya Îranê îdiayê dike ku di salekê de 12 hezar û 360 kesan ji bo şêwr û dermanê serdana navendên pêwendîdarî rêkxistin û saziyên wan kiriye û ji vî hejmarê, 9 hezar û 880 kesan dermanên pêwîst ji bo lihemberderketina wê nexweşiyê wergirtine.

Li tevahiya Îranê, hezar û 500 navendên haydarkirin ji HIV hene. Ew dibêjin li gor rêkeftinên navdewletî, divê heya sala 2030'an navên 90 ji sedî tûşbûyên wê nexweşiyê li Îranê bêne tonarkirin û ji bo dermanê serdana navend û cihên pêwendîdar bikin. Herwisa Komara Îslamî hatiye erkdarkirin ku rê li ber giştgirbûna aydzê li wî welatî bigire.

Li hemû cîhanê nêzîkî 37 milyon kesan tûşî wê nexweşiyê

bûne. Di 2012'an de 10,6 mîlyon kesan derman bikar anîn, di 2013'ande ew hejmar bû 13 mîlyon. Yê ku nekarîn derman bibin jî li welatên xizan dijîn û piranî ne xwedî derfet in. Tenê 19 mîlyon kes ji hejmara giştî dizane ku bi wê nexweşiyê ketiye. Ji ber kêmbûna derfetên Tibbî bi mîlyonan kes ji bo nexweşiya xwe teşîst bike ji testan bêpar dimîne.

Yekemîn car 30 salan beriya niha HIV li Îranê hate dîtin. Wê demê xwîna ku ji kompaniyeke Fransî hatibû Îranê, dabûne zarokek berketî bi nexweşiya Hêmoofilî. Piştî çend salan hejmara tûşbûyên wê nexweşiyê li wî welatî giştê 200 heya 500 kesan. Pişt re di nav wan kesan de ku bi gelek kesan re seksê dikin û di nav tûşbûyên madeyên hişber de jî hate dîtin. Ji 12 salan beriya niha ve para herî zêde ji seksê û pişt re ji derziyan ji aliyê bikarhênerên madeyên hişber ve bûye û ti tûşbûneke HIV bi xwîna hawirdekirî nehatiye tomarkirin.

Di derbarê xwîna pîs de dosyeyek li dadgehê hate vekirin û saziya Veguheştina Xwîne ya Îranê bi dayîna xerameyê bi malbatên 974 kesan hate cezakirin lê wê biryara dadgehê, ne karî re li ber bilindbûna amarên tûşbûyên HIV bigire û ne jî tendiruştiya tûşbûyên ji ber xwîna pîs ya hawirdekirî ji Fransayê vegeheriya. Ji kesên ku bi nexweşiya HIV dikevin ji sêyan du li wan welatan in ku dikarin xwe bigihînn dermanan. Tenê di sala 2013'an de 1,5 mîlyonek kes ji AIDSê mirine. Hejmara kesên ku derman dibin zêde bûye. Li gorî raporên UNAIDS'ê bi taybet ev nexweşî li Rojhilata Navîn û welatên Ewropaya Navîn bilind dibe.

Şeva Yelda û roja jidayîkbûna “Pêxemberê Aştîyê” bilind hate nirxandin

Rêuresmek taybet bi boneya bilindragirtina şeva Yeldayê û roja jidayîkbûna rêberê egîd ê gelê Kurd, Dr. “Ebdulrehman Qasimo”, bi rê ve çû.

Êvara roja Înê, 29`ê Ser-mawezê, Yekîtiya Ciwanên Demokrat a Kurdiştana Îranê, rêuresmek bi hilkefta vebîranîna şeva jidayîkbûna rêberê zana yê gelê Kurd, Dr. “Qasimlo”yê nemir, birêve birin.

Ew rêuresim, bi marşa netewî ya “Ey Reqîb” û ragirtine bîstek bêdengî, ji bo canê paqij ê Şehîdên Kurd û Kurdiştanê deşt pêkir.

Piştê peyama Yekîtiya Ciwanan, bi boneya şeva Yeldayê, ji aliyê “Saman Seyîd Ehm-



edî” ve, hate pêşkêşkirin. Paşê şemala 89 saliya jidayîkbûna Dukturê zana, ji aliyê “Bêrîvan Heyderî” û “Çalak Îsma`ilî” ve, hate hilkirin.

Piştê Dr. “Mîro Eliyar”, endamê Navenda Siyasî yê PDKÎ, li derheqê kesayetiya Dr. “Qasimlo”, çend gotinek

pêşkêş kir. Navbirî di gotinên xwe de, tevî pîrozkirina wê hilkeftê baskir ku, Dr. “Qasimlo”, tevî wê ku tenê 59 salan jiya, lê jiyanekî pir ji berhem hebû ku em dikarin çendîn pirtûkan li ser binivîsin.

Herwisa Dr. “Eliyar” bi îşarekirin bi hin taybetmendiyên wekî xakîbûn, azad-

bûn, modêrnûn, hizirkar û çendîn taybetiyên din yên, Dr. “Qasimlo”, basa vê yekê jî kir ku, dibe bo naskirina wî rêberê nemir, li ser wan taybetmendiyên navbirî, semînarên cuda bêne girtin.

Herwisa navbirî got: “Dr. Qasimlo mirovek bû ku xwediyê hemû taybetmendiyên mirovên din hebû lê mirovekî mezin bû”.

Rêuresim, bi çendîn helbest û stran û çend tabloyên dîlanê û birêvebirina dîlanê hatibû xemilandin.

Di parek din a rêuresmê de, lewheya rêzgirtinê bi hinek kesan re hate pêşkêşkirin ku, di birêvebirina karên Yekîtiya Ciwanan de alîkar bûn. Rêuresim bi dîlan û daweta amadebûyan dawî pêhat.

Xelata “Dayîka Aştîyê” bi daye Şerîfe hate pêşkêşkirin

Heyeteke hevpar a PDKÎ û Yekîtiya Jinên Demokrat a Kurdiştana Îranê, di rêuresmekî rêzgirtinê ji “Daye Şerîfe”, dayîka şehîd “Ramîn Husên Penahî”, amade bûn.

Di wê rêuresmê de ku di hotêla “Şîraton” a bajarê Hewlerê de bi rê ve çû, ji aliyê Saziya Aştîyê ya xêrxwaziyê ve, xelata zêrîn a “Dayîka Aştîyê”yê, bi “Daye Şerîfe”, dayîka Şehîd “Ramîn Husên Penahî” hate bexşîn.

Ev xelate di hember hewil û çalakiyên navbirî, li warê aştî û hewildan û pêşgirtin ji cezayê jidarvekirinê di Îranê de, pê re hate bexşîn.

Rêuresim ku bi bîstekê bêdengî ji bo rêzgirtin ji canê paqij ê şehîdan deşt pêkir. Piştî xwendina peyama Saziya Aştîyê, xelata Dayîka Aştîyê, pêşkêşê “Emced Husên Penahî”, nûnerê daye Şerîfe, kirin.

Piştê ji aliyê “Emced Hisên Penahî” ve, peyama daye Şerîfe hate xwendinê. Di wê rêuresmê de, ji aliyê nûnerên Partiya Demokrat û Yekîtiya Jinan ve, deşte



gulek emegnasî û rêzgirtinê, pêşkêşê nûnerê daye Şerîfe kirin, “Mihemedsalih Qadirî”, berpîrsê Pêwendiyên Kurdiştanê ya PDKÎ, di wê rêuresmê de îşare bi wê yekê kir ku, daye Şerîfe û hemû dayîk, xwişk, hevjinên Şehîdan, hepsî û têkoşer, pêşeng û rûmeta xw-

eragiriyê û xebata vekhevî û mirovantiyê ne.

Herwisa “Qadirî” basa vê yekê kir ku, ev rêzgirtina li daye Şerîfe, rêzgirtine ji hemû ev xebatkarên Rojhilatê Kurdiştanê, her ji bo wê jî, em hemû xortên daye Şerîfanin.

Rêuresim, bi amadebûna Saziyên nehikûmî, serkirdeyên aliyên siyasî yên Kurdiştanê, nûnerên balyozxaneyên bîhanî di herêma Kurdiştanê de, çalakvanên siyasî û mafê mirov û roj-namevanan, bi rê ve çû.

Piraniya dibistanên parêzgeha Sineyê kevnin



Di parêzgeha Sineyê de piraniya dibistanan kevnarin û gelek ji wan jî kanêksî ne, her bi vê sedemê gelek zarokên dersxan neçar in dev ji dersxwendinê berdin.

Parêzgeha Sineyê xwdiyê 3800 dibistana ye ku, ji wê hejmarê nêzî 1/3 a wî parêzgehê hewcehî bi nûjenkirinê heye.

Herwisa di parêzgeha Sineyê de nêzî 88 dibistan dibe bêne herifin û li serî de bêne avadenkirin.


Eve di demekê de ye ku, heyamek beriya niha, Serokê Odeya Bazirganî, Xulamhusên Şafi`î gotibû, em

çavniherî aramiya Sûriyê ne ku, em bikarin bi giştî avedan bikin. Û navbirî gotibû, Îranê sê sal beriya niha jî, di avedankirina Sûriyê de rol hebûye.

Eve di halekê de ye ku, rejîm tenê dizane bûdceya welat terxanê derveyê welat bike û ti girîngiyekê bi navxweyê welat nede.

Ji aliyek din ve jî, di 66 gundên parêzgeha Sineyê de heya niha jî, ji dibistanê kanêksî mifahê verdigrin. Rewşa xirab a dibistanan wisa kiriye ku hejmarek ji zarokên dersxwan dev ji dersxwandinê berdin.

Girtiyekî siyasî yê Kurd di girtîgeha “Mescid Silêman”ê de dest avête bi gireva birçîbûnê



Girtiyekî siyasî yê Kurd, xelkê bajarê Kamiyaranê, bi sedema nevegustaîna wî bo nexweşxana derveyê girtîgehê, dest avitiye bi gireva birçîbûnê.

Pêka rapora ku gihîştîye Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, roja Çarşemî, 20`ê Sermawezê “Çengîz Qedem Xêr”, hepsiyê siyasî yê Kurd yê xelkê bajarê Kamiyaranê, li girtîgeha “Mescid Silêman”ê dest avêtiye bi gireva birçîbûnê.

Ew hepsiyê siyasî yê Kurd, bi sedema bêparkirina wî ji çareseriyê pizîşkîyê û nevegustaîna wî bo nexweşxana derveyê girtîgehê dest avêtiye bi gireva birçîbûnê.

Pêka gotina çavkaniyekî agehdar, berpisên girtîgeha “Mescid Silêman” û navendê Îtila`atê û leşkerî, pêşî ji vegustaîna wî hepsiyê siyasî

yê Kurd bo nexweşxaneya derveyê girtîgehê girtine. “Çengîz Qedemxêr”, raştî nexweşîya Gurçikan hatiye û rewşa tendurustîya wî xirabe. Berê jî ew hepsiyê siyasî bi sedema mudaxileya Wezaretê Îtila`atê li neşandina wî bo mirexesiya pizîşkî, dest avêtibû girev girtinê.

“Çengîz Qedemxêr” xelkê bajarê Kamiyaranê ye û di meha Cozerdana sala 1390`an de, di derdora bajarê Sinê de, ji aliyê hêzên Îtila`ata Spaha Pasdaran ve hatibû desteserkirinê.

Ew hepsiyê siyasî, ji aliyê saziya dadwerî ya hikûmeta Îslamî ya Îranê ve bi tohmetya “Cehdkirin li dijî asayîşa netewî û endamê yek ji Partiyên Kurdî”, bi 40 sala heps, hatiye cezadan.

“Mescid Silêman”, 470 Kîlometran ji cihê ji dayîkbûna wî girtiyê Kurd, dûre.

Berpirsên girtîgeha bajarê Seqizê pêşî ji çareseriyê pizîşkî ya girtiyekî digrin

Berpirsên girtîgeha navendî ya bajarê Seqizê, rê ji vegustaîna girtiyekê bo nexweşxaneya derveyê girtîgehê digrin ku raştî cilte lêdanê hatiye.

Pêka rapora ku gihîştîye Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, çend roj beriya niha, girtiyek bi navê “Husên Heyderî”, xelkê bajarê Seqizê, di girtîgehê de raştî cilte lêdanê hatibû û berpirsên girtîgehê jî îzina birêkirina navbirî bo nexweşxaneya derveyê girtîgehê nadin.

Çavkaniyekê agehdar di vê derheqê de bi Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê re ragihandin: “Kadrên dermanî yên

bêhdarî yên girtîgeha Seqizê, îzina vegustaîna wî girtiyê bo nexweşxaneya derveyê girtîgehê dane, lê berpirsên girtîgehê rê nedane bibin.”


Herwisa wê çavkaniyê gotiye: “Kadrên dermanî yên bêhdariya girtîgeha Seqizê, ji berpirsên girtîgehê re ragihandine ku dibe, “Husên Heyderî” bo nexweşxaneya Xumênî a wî bajarî bê vegustaîna wî dibe bê razandin û ji bo wî tedawiya pizîşkî bê kirin, lê berpirsên girtîgehê îzin nedane.”

Herwisa wê çavkaniyê wiha jî gotiye, nêzî heftiyek beriya niha, “Husên Heyderî” di girtîgehê de raştî celte lêdanê



hatiye û berpirsên girtîgehê ti pêngavek bo çareseriyê pizîşkî ya wî girtiyê neavêtine û ti hewlek nedane.

14 hezar rûpelên destnivîsên Kurdî yên kevn hatin dîtin



Li Pirtûkxaneya Niştîmanî ya Fransayê hejmareke destnivîsîn Kurdî yên kevn hatin dîtin ku ji 14 hezar rûpel pêk tê û sala 1812an hatine nivîsandin. Beşek ji wan destnivîsan weke kitêb ji aliyê du mamosteyên zanîngeha Selahedînê ve hatin çapkirin. Ew mamoste dibêjin, çend destnivîsên din jî hatine dîtin ku dîroka pexşana Kurdî diguherin.

Ew herdu mamosteyên bi navên Dilşad Hîwa û Sena

Hesen hevjin in û li zanîngeha Selahedînê kar dikin. Dilşad Hîwa ku mamosteyê ziman û wêjeya Farisî ye, ji Rûdawê re ragihand, “Ew destnivîs li Pirtûkxaneya Niştîmanî ya Fransayê (BNF) destpêka sala 2019an hatine dîtin, karê 5-6 mehan bû. Ji nêzikî 14 hezar rûpelan û ji 26 bergan pêk dihatin. 14 berg bi Kurmanciya xwarê (Sorani) û 12 bergên din bi diyalektê Goranî ya şewazê Hewramî ye. Ew ên ku bi Soranî hatine nivîsandin,

zêdetir bi şewazarê Hewlêrê ne, lêbelê me nav lê kiriye zimanê yekgirtî yê Kurdî, ji ber ku peyvên Soranî, Kurmancî, Hewramî, Kelhorî û hemû şewazarên Kurdî tê de ne. Zimanekî gelek xwerû ye.”

Dilşad Hîwa amaje bi wê kir ku hemû destnivîsên hatine dîtin çîrok in. Çîrokên welatên Rojhilata Navîn in weke, çîrokên Hezar û Yek Şev û Leyla û Mecnûn. Di wan 26 bergan de tenê 5 berg hatine çapkirin ku beşa Soranî ye, ji aliyê Akademiya Kurdistanê ve 500 heb jê hatine çapkirin.

Li gor lêkolînên Dilşad Hîwa û hevjinê wî Sena Hesen, ew destnivîs destpêka sala 1806an ji aliyê rojhilatnasê Fransî Jan Lui Esolan Du Shervil li Qahîreyê hatine komkirin û paşê, bi rêya wî rojhilatnasî ve bi çend wergerekî Kurd hatine dayîn, her li Qahîrê sala 1812an

wergera wan bo Kurdî temam bûye. Dilşad Hîwa dibêje, “Ew ên ku wergera wan kirine, navê ti kes ji wan diyar nîne, lêbelê zanîngeha ji Ezherê bûne û mela û feqê bûne.

Dilşad Hîwa dibêje, beşek ji karê zehmet, “xwendina xetan bûye” û herwiha diyar dike, “Bi grûp kar li ser hat kirin. 8-6 kes kar hat kirin. Lê ew ên ku karê sereke kirin, Sena Hesen bû, biryara dawîn ya bo her tîp, peyv û rîsteyan ji aliyê wê ve dihat dayîn ku pispora destnivîsên kevn e.”

Niha 21 berg mane bo ku bên saxkirin, lêbelê Dilşad Hîwa dibêje, “Ne destpêk diyar e, ne jî dawî, gelek tîkel in, lê em dizanin salên 1806-1822 hatine wergerandin. Li gor plansaziya me, em ê di du salên bê de hemûyan çap bikin.” Rûdaw

Pêşmerge



N: Hejar Paar (Kelankanî)

Pêşmerge raman û soz e
Pêşmerge armanc û doz e
Pêşmerge rûmet û ar e
Dilê me da tim buhar e
Pêşmerge serwer û can e
Ji bo me hebûn û man e
roj a dilê me bindestan
Şeva dilê dagîrkeran
Parêzerê me kûrdan e
bahoza ser neyaran e
Mizgîn a azadîyê ye
Rêya mirovahîyê ye



pêşmerge bawer û şan e
dawî ya derdê kûrdan e
Pêşmerge behra jîyanê
Di nav dilê Kurdistanê
Mala wî çîya û esman
Sunda ku tîne ser ziman
Yan azadî ye yan neman
Yan mirin e yan kurdiştan
Mertal û xîret û xak e
Soza xwe qed ji bîr nake
Şêr e li meydan û bajaran
Ser dijminan dibe tofan
Pêşmerge hebe em hene
Çîyan e li ber piştta me ne
Rewan û ruh û birîn e
Hevî ye xebat û jîn e

Zimanê Kurdî

- Jinên zana ji yên nezan çêtir in .

Di kurmanciya xwarê de cînavê “hî” bo her dû zayendên yekjimar û komjimar bikar tê .

Bêguman ev cînavên peywendî di reseniya xwe de zêderên (veqetandekên) nav û cînavan in, zayend û jimara wan destnîşan dikin . Wek :

- Ev hevalê min e (nêrê yekjimar)
- Ev hevala Zînê ye (mêyê yekjimar)
- Ev hevalên me ne (nêr û mêyên komjimar)

Di van mînakên de navê “heval” navekî bêhêl e (bêlayan e), bo her dû zayendan (nêr û mê) bikar tê . Bi van zêderan “ê, a, ên” em dizanin, kîjan “heval” nêr e û kîjan mê ye, kîjan yekjimar e û kîjan komjimar e . Lê dema ku nav têne avêtin û zêder cihê wan digrin, hingê ew zêder dibin cînav û li gora wan navên avêtî cihên xwe di pêvajoya hevokan de dibînin :

Wek :

- Ev dostê min e, ka (dost)ê te ?
(Ev dostê min e, ka (...) yê te ?

- Ev došta Zînê ye, ka (dost) a Fatê ?
[Ev došta Zînê ye, ka (...) ya Fatê ?]
- Ev hevalên me ne, ka (heval) ên we ?
[Ev hevalên me ne, ka (...) yên we ?]

Wilo jî, ku zêdera navekî dûbare bibe, zêdera dûwem a ku serbixwe tê nivîsîn dibe cînavê peywendî û têkiliya wî navê avêtî bi pêgirên wî, yên paş xwe ve destnîşan dike . Wek :

- Birayê min, ê mezin bûye mamoste .
[Birayê min, (bira) yê mezin bûye mamoste].

- Ew xuşka te, ya jîr li kû ye ?
[Ew xuşka te, (xuşk) a jîr li kû ye ?]

- Ka ew hevalên me yên dilsoz ?
[Ka ew hevalên me (heval) ên dilsoz ?]

Li hindê herêman zêdera dûbare, ya ku dibe cînavê peywendî li şûna “ê- yê , a – ya , ên - yên”, bi şeweyê “î, yî,” bikar tê . Wek :

- Hevalê min ê dilsoz
(Hevalê min î dilsoz)

- Pênûsa te ya sor

(Pênûsa te yî sor) . - Çiyayên me yên bilind (Çiyayên me yî bilind) .

Bi rastî mijara zêdera dûwem mijareke pir giring e, pêdivî ye ku zelal bibe, zêder û cînav ji hev bêne nasîn da ku wateyên hevokan, li wê gorê ronî bibin. Lewra hindê hevok li gora rastnivîsa wan zêder û cînavan, wateyên wan zelal dibin . Wek :

- 1- Birayê Hesoyê şivan nexweş e .
- 2- Birayê Heso yê şivan nexweş e .

Berçav e ku me mînaka xwe bi dû şeweyan nivîsiye, me , carekê “yê” bi “Heso” ve nivîsiye û carekê jî me “yê” serbixwe nivîsiye . Vêca li wê gorê em ê bipirsîn : Gelo di wan her dû şeweyan de, yê şivan kî ye ? Heso ye yan birayê wî ye ?! - Di şeweyê (1) ê de, yê şivan Heso ye. Ji ber ku (yê), zêdera navê Heso ye û pê ve hatiye nivîsîn . Bi wê têgehê wateya mînakê ev e : - (Hesoyê şivan, birayê wî nexweş e) .

- Di şeweyê (2) ê de, yê şivan birayê Heso ye. Ji ber ku (yê) cînavê peywendî ye, serbixwe hatiye nivîsîn, lê ji hêla wateyê bi navê (bira) ve girêdayî ye û cihê wî girtiye: - (Birayê Heso, (bira) yê şivan nexweş e) .

Cînavên peywendî jî, weku navan, di rêxistina hevokan de dibin kara (kiryar, kirar) û berkar (serve, bireser), anku cihê navên kara û berkar digrin :

Kara:

- Birayê min li gund e û yê te çû bajêr . - Xuşka min a biçûk dixwîne . - Pelên daran, ên zer diweşin . Berçav e ku ev cînavên peywendî “yê, a, ên”, di mînakên jorîn de, bûne karayên van karan (lêkeran), “çû, dixwîne, diweşin” .

Berkar:

Li gora raweyên hevokan, cînavên peywendî dibin berkarên raşteder (raştewxo) û yên nerasteder : 1- Berkarên raşteder :

- Ez birayê te dinasim, ma tu jî yê min dinasî ?
- Min dara çinarê dîtiye, lê min ya gezê nedîtiye
- Kesê darên we birrîn bila yên me jî bibirre.

Di van mînakên de cînavên “yê, ya, yên” bûne berkarên raşteder, yên van karên derhingêv (têper) “dinasî, nedîtiye, bibirre” . 2- Berkarên nerasteder :

Dom heye...

Agirî

- ◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdiştanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (364)

Yelda, şeva jidayîkbûna rêberê aştîxwaz ê gelê Kurd e

